Bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê Kurd di çarçoveya Îranek Demokratîk û Federalî de

Hejmar: 40
31'ê May 2006
Buha: 150 Tûmen

# agiri

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

## Di Xwenîşandana Nexedê De 8 Kes Hatin Kuştin

Roja pêncşem, 25.05.2006'an, ji bo hevdengî û hevxemî a Azeriyên din yên Îranê, nişteciyên bajarê Nexedê yên Kurd û Azerî bi hev re xwenîşandanek bi dijî siyasetên qirêj yên Komara Îslamî û sivikatî kirina Rojnameya "IRAN" bi Azeriyan re, pêk anîn.... **R. 5**



# KURDAN JÎ BÊ HURMETÎ BI AZERIYAN RE QEBÛL NEKIRIN



Piştî weşandina karîkatorekê di rojnameya "IRAN"ê de ku tê de sivikatî û bêhurmetî bi gelê Azerî re hatibû kirin, li piraniya bajarên ku Azerî tê de akincî ne û her wiha li Tehranê meş û xwenîşandanên şermezarkirinê dest pê bûn. Ev serhildana mezin a nerazîbûnê niha jî her didome.

Li hin bajarên Kurdistanê, gelê Kurd û nemaze xwendekarên Kurd ên zanîngehên cur bi cur yên Îranê tevlî vê meşa nerazîbûnê bûn û ji bo nîşandana nerazîbûna xwe tevî gelê Azerî dijî siyasetên nejadperestane ên rejîma Îslamî a Îranê dijî gelê Azerî û neteweyên din ên Îranê beşdarî kirin. Di vê serhildanê de dehan kes hatne kuştin û sedan kes birîndar bûne û hezaran kes jî hatne binçav kirin û di bin îşkenceyên hov û nemirovane de ne. Li wan bajarên Îranê ku Kurd û Azerî bi hev re dijîn û Kurd tevlî meşên şermezarkirina birayên xwe yên Azerî bibûn, rejîmê ji hêla kirêgirtiyên xwe xwest û dixwaze wekî her car siyaset û komploya dubend û nakokiyê bixe nava gelê Kurd û Azerî û vê hevxebatiya nû û bê veger bi rêyeke xirab û nebaş de bibe. Bê guman hemû neteweyên Îranê êdî ji van kiryar û siyasetên qirêj ên hikûmeta Îslamî hesiyane û bi wan nahên xapandin. Rojeva siyasî ya Îranê bi serhildana gelê Azerî pêvajoyeke gur û nû bi xwe girtiye û gelên Îranê hetanî hilweşandina vê rejîma dîktator û avakirian sîstekeme dempkratîk û federalî ji xebatê nasekinin.

## Civîna Koma Xebata Kurd Ya Enternasyonala Sosyalîst Li Kurdistanê

Demjimêr 11: 30'ê pêşnîvroya roja duşem, 29.05.2006'an, civîna Koma Xebata Kurd ya Enternasyonala Sosyalîs li havîne warê Dukan li Herêma Kurdistanê hate lidarxistin.

Ev civîne bi beşdariya Loyîs Eyala, Sekreterê Giştî, hejmarek ji şandên partiyên endamên "SI"'ê, Konî Firîdrîkson, Serokê Koma Xebata Kurd ya "SI"yê û endamê Koma Xebata Kurdan li welatê Fransayê, Norwej, Swêd, Îtalya, Yûnan û her wiha nûnerên partiyên Kurdistanî wek PDK Îranê, YNK, PDK, Partiya Demokratîka Gel li Turkiyê û Komeleya Şoreşvanên Zehmetkêş ya Kurdistana Îranê pêk hat.

Civîn bi axavtina kurt ya birêz Celal Talebanî, Serok Komarê Îraqa Federal hate vekirin. Piştre bi axavtina Loyîs Eyala, Sekreterê Giştî yê "SI"'ê, civînê karê xwe dest pê kir. Di civînê de rewşa giştî ya Kurdistana Îraqê, Îran û Kurdistana Îranê, Turkiyê û Kurdistana Turkiyê her yek bi cuda ketin ber bas û nîqaşê û derheq her yek ji basan de desteya nûneriya kurd li her yek ji parçeyên Kurdistanê, baseke giştî û berfireh û piralî pêşkêşî beşdarên civînê kirin. Piştî her bas û raporekê li ser rewşa giştî a her yek ji wan welatan, beşdarên civînê dîtin û nêrînên xwe di vê derbarê de xuya dikirin.



**Loyîs Eyala û Hesen Şerefî di Kongreya rojnamevaniyê a paş civîna "SI"yê**

Ji aliyê PDK Îranê ve jî ku endamê "SI" û endam di Koma Xebata Kurd ya Enternasyonala Sosyalîst de ye, şandek bi serokatiya birêz Hesen Şerefî, Cîgirê Sekreterê Giştî yê PDK Îranê, Birêz Erfan Rehnimûn, Ravêjkarê Komîteya Navendî û Seedî Ebdî, Kadroyê Têkiliyên Navneteweyî yê partiyê beşdar bû. Rapora berfireh ya civînê û axaftina hêja Hesen Şerefî di hejmara tê ya Agirî belav dibe.

## Daxuyanî

**PDK Îranê Tevî Mehkûmkirina Her Cure Riftareke Serkutkarane Ya Rejîmê, Piştgirî Û Hevxebatiya Xwe Ji Bo Hemû Gelên Zulmlêkirî Ên Îranê Dubare dike**

Di daxuyaniyeke çapemeniyê de PDK Îranê bêhurmetiya rojnama "IRAN"ê bi gelê Azerî mehkûm kir û piştgirî da serhildana vî gelî ...



**R. 2**

## Sekreterê Giştî Yê PDK Îranê, Birêz Mistefa Hicrî:



"Kurd û Turk bi dirêjahiya sedan salan di parek ji cihên akicîtiya xwe de pev re jiyane. Di vê midehê zaf serpêhatiyên tal û şirîn bi hev re hene. Hewceye bi ders û ezmûn wergirtin ji hemû van bîranînane, her du alî bîr ji bi hev re jiyaneke aştiyane û şaristaniyane bikin"

Hevpeyvîn R.3-4

## Sîbera Tarî Ya Mêr Serdestiyê Pirsgirêka Mezin Ya Jinên Kurd


Hêj kesayetiya jinan weke kesayetiyeke serbixwe nehatiye naskirin...



**R. 6**

## Bi Zimanzan Samî Tan Re, Hevpeyvînek Li Ser Rewşa Edebiyata Kurdî:


Samî Tan:
**"DÎ HİŞYARBÛNA MILETAN DE, ZİMAN ROLEKE SEREKE DİLÎZE"**



Hevpeyvîn R. 8-9

## ZIMAN Û ZEMAN

ziman hebûneke jîndar e û her gav xwe nû dike. Em bixwazin û nexwazin jî ziman xwe li gorî zemên nû dike ...



**R. 10**

# Daxuyanî
# PDK Îranê Tevî Mehkûmkirina Her Cure Riftareke Serkutkarane Ya Rejîmê, Piştgirî Û Hevxebatiya Xwe Ji Bo Hemû Gelên Zulmlêkirî Ên Îranê Dubare dike

**Hevwelatiyên hêja!**
**Gelên azadîxwaz ên Îranê!**

Rejîma Komara Îslamî di pêvajoya serkut û çewisandina gelên zulmlêkirî yên Îranbê de ku bi dirêjiya temenê vê rejîmê berdewam di holê de bûye, di van rojên dawiyê de pêleke nû ji zext û tund û tûjiyê hember gelên bêpar ji azadî û mafê neteweyî ên Îranê dest p; kiriye.

Xortên neteweya Belûç di vê dawiyê de bi hêcetên cuda cuda yê ketine ber êrîşa leşkerî ya hêzên rejîmê û bi awayekî gelek hov û dirindane tên tepeserkirin. Malên van kavil û wêran hatine kirin û sedan kes ji wan yê hatine binçav kirin û ji girtingehê re hatine şandin û hejmareke xuya ji xortên vî gelî jî hatine kuştin yan hatine birîndar kirin.

Hevdem tevî êrîşa leşkerî bo ser gelê Belûç, sivikatîkirin bi gelê Azerî di rojnameya "IRAN"ê de, naveroka dijî gelî a Komara Îslamî pêtir derxist û nîşan da ku ev rejîme hetanî çi qasekê eşkere û bêtirs bêhurmetiyê bi gelên Îranê dike û seha neteweyî ya wan birîndar dike û demekê jî ku rejîm tevî nerazîbûn bi vê sivikatî pê kirinê berbirû dibe û xelk dirijne ser şeqam û rêgehan û xwendekar di zanîngeh de xwenîşandanên biewle lidar dixin, bi awayê herî tund tên qir kirin û bi guleyan cehd û hewla bêdeng kirin û fetisandina wan tê dayîn. Bi terzekê ku tenê di van çend rojên dawiyê de dehan kes li bajarên cur bi cur, nemaze li Tewrêzê birîndar û dehan kes jî binçav rapêçî girtîgehê hatine kirin.

Ev liv û riftara rejîmê ku berê derheq gelê Ereb yê Xozistanê jî hate encam dan û bi dirêjiya temenê rejîmê li hember gelê azadîxwaz û mafxwaz yê Kurd jî hate meşandin, ji aliyekê kekil û naveroka kevneperestane û dijî gelî ya rejîma Komara Îslamî ya Îranê dide xuya kirin û ji aliyê din jî xurtbûna seha neteweyî ya gelên zulmlêkirî ên Îranê û pan û berfirehbûna xebata azadîxwazane û neteweyî a wan gelane nîşan dide.

Seba vê pêla nû ku rejîma Komara Îslamî li serkuta xortênên Belûç û Azerî di Îranê de birê xistiye, PDK Îranê tevî mehkûmkirina her cure kiryar û liveke tepeserkarane a rejîmê, piştgîrî û hevxebatiya xwe ji bo hemû gelên zulmlêkirî ên Îranê dubare dike û careke din vê rastiyê dixe berçav ku hevgirtina tev gelên bin stema Îranê sedemeke herî sereke ji bo hilweşandina rejîma Komara Îslamî ye û cihgirbûna demokrasiyê û bidestveanîna mafê neteweyî yên gişt gelên Îranê di Îraneke demokratîk û federalî de.

**Hevgirtî be xebata hevpar ya hemû gelên Îranê dijî dîktatorî û kevneperestiyê**

**Bihiloşe rejîma dijî gelî ya Komara Îslamî ya Îranê**

**Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê**
**Deftera Siyasî**
**25.05.2006**
**04.03.1385**

# Daxuyaniya Kongireya Neteweyên Îrana Federal Li Ser Bûyerên Vê Dawiyê Yên Azerbaycan Û Belûçistanê

**Xelkê bi şan û şeref yê Îranê!**
**Hevwelatî ên hêja!**

Givaş, zordarî û destdirêjî ji bo ser herêma çandî, neteweyî û pîvanên sincî û bi giştî heta mafên mirovî û qanûnî yên herî sereke ên neteweyên Îranê her wisan ji aliyê rejîma hov û cinayetkar a Komara Îslamî didome. Ji bo hemûyan ron û eşkere ye ku heke hetanî duhî dewleta Îslamî ya Îranê bi cuda xelkê Kurdistanê xistibûye ber armanca givaşa leşkerî û aborî û bi merema ji holê rakirina cih û warên çandî û netewî yên wan, gelek pêre neçû ku neteweyên Ereb û Turkmen yek ji pey yekê bi maşîna tepeserker ya Melayan, bi hêcetên bê bingeh, bi awayên herî tund qetilandin, di demekê de ku daxwaziyên wan tiştek cuda ji cî bi cî kirina Kakil û naveroka qanûnên navneteweyî û mafê mirovan nine.

**Hevwelatîno!**

Di dema çend hefteyên derbasbûyî de li Belûçistanê, hêzên leşkerî yên rejîmê ji bo têkşikandina daxwaziyên berheq yên neteweya Belûç, hêzên xwe amade û teyar kiriye û hejmarek zaf ji xelkê bêguneh û sivîl binçav û şehîd kiriye û hetanî niha jî ev tepeserîkirine didome.

Piştî belavkirina karîkatora bêhurmetîker bi neteweya Azerî ku di rojnameya fermî ya "IRAN"ê de çap bibû, çend rojek dibe gişt Azeriyên bajarên: Tewrêz, Urmiye, Meraxe, Zencan û ... bi awayekî berfireh nerazîbûn xuya kirine û tevî êrîşa hêzên Întizamî ên rejîmê berbirû bûne, di vê derheqê de hejmarek ji welatiyên birîndar bûn û gelek kes jî hatine binçav kirin.

Di zanîngeha Tewrêzê û Tehranê de xwendekarên xebatkar piştgirî ji daxwazên rewa yên xelkê kirine û kiryara hêzên rejîmê mehkûm kirine.

Rejîma Komara Îslamî pêka siyasetên dijî gelî yên xwe di heyama salên berî de tevgera neteweyên Îranê bi awayekî cur bi cur tepeser kiriye û ew girêdayî bi biyanoyan hesibandiye, di demekê de ji bo tev xelkê Îranê û cîhanê ron bûye ku vê rejîma şerxwaz û parêzerê teror û dijî azadiyê, ji bo mana li ser desthilata xwe aştî û tenahiya herêmê yê biriye bin pirsê û xistiye tirsê.

Kongireya Netweyên Îrana Federal ku rêxistina hemû neteweyên Îranê di qonaxa hestyar ya niha de ye, piştevaniya xwe ya xurt ji xebata neteweyên Azerî, Belûç, Ereb, ji bo pêşdebirina demokrasî û mafên neteweyî dike û ji tev azadîxwaz, ronakbîr û rêxistinên demokrat ên Îranê û saziyên neteweyî, nemaze Rêxistina Neteweyên Yekbûyî daxwazê dike, ji bo jorde birina pîvanên mirovî û civakî, rejîma terorîstperwer ya Îslamî şermezar bikin û pêşiya kiryarên dijî mirovî bigirin û piştgiryê ji daxwazên neteweyên Îranê ji bo bidestveanîna mafên berheq û mirovî û civakî ên wan bikin.

Her wiha di vê qonaxa dîrokî de hêvî û çavnihêrî ji tev neteweyên Îranê eva ye ku refên xwe hevgirtî û xurt bikin û bo piştgirî ji hev rabin û siyaseta dubendî xistina rejîmê pûç û vala bikin.

**Şanda Birêveber ya Kongireya Neteweyên Îrana Federal**
**22.05.2006**

www.arsivakurd.org


**Sekreterê Giştî Yê PDK Îranê Di Hevpeyvînekê De Tevî Malpera Kurdistanmedia.org**

## "KURD Û TURK BÎ DÎRÊJAHİYA SEDANSALAN DÎ PAREK JÎ CÎHÊN AKÎCÎTÎYA XWE DE PEV RE JÎYANE. DÎ VÊ MÎDEHÊ ZAF SERPÊ HATÎYÊN TAL Û ŞÎRÎN BÎ HEV RE HENE. HEWCEYE BÎ DERS Û EZMÛN WERGÎRTİN JÎ HEMÛ VAN BÎRANÎNANE, HER DU ALÎ BÎR JÎ BÎ HEV RE JÎYANEKE AŞTÎYANE Û ŞARÎSTANÎYANE BÎKÎN"

**Hevpeyvîn: Birahîm Lacanî**

**Birêz Kekê Mistefa Hicrî, berî her tiştî ez sipasiya te dikim ji bo qebûlkirina daxwaza me bona vê hevpeyvînê. Ez dixwazim gotûbêjê bi vê pirsyarê dest pê bikim ku armanca te ji vê seferê bo dereveyî welat çiye?**

**M.H:** Ez iznê dixwazim li berahiyê de sipasiya we û xwendevanên rêzdar ên we bikim. Sefera vê carê ya min ji bo derveyî welat, wekî caran û li gor erk û karek ku li stûyê min e, pêregihîştin bi komek kar û xebatê partiyê ye. Lê armanca sereke, nûkirin û xurtkirina têkiliyan tevî wan aliyane ye ku partiyê têkilî bi wan re hebûye. Bi taybetî ku di vê yek sala dawiyê de Komara Îslamî di warê pêpeskirina mafê mirovan, meytêkirin di kar û barên hundir yên welatên dereve, piştevanîkirin ji terorîzmê û pitir ji hemûyan jî pirojeya çekên Etomî yê bûye cihê bas û qal, pirsyar û gotûbêjên civaka navneteweyî. Me bi hewce zanî ji bo guhartina bîr û ramanan tevî hin kom, navend û kesayetiyên siyasî yên derve hevdîtinan bikin. Diyare di vê heyamê de me dê rûniştin tevî çendîn kesayetî û rêberên Opozîsyona Demokrat ya Îranê de jî hebe.



**Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê**

**Siyaseta Komara Îslamî di pêwendî tevî xurtkirina vejena etomî de wekî leîstina bi qazanc û berjwendiyên neteweyî yên gelên Îranê tê ibandin. Rejîm amade nine ku yasa û qanûnên pesendkirî yên navneteweyî yên têkildar bi xurtkirina vejena etomî barçav bigire. Niha pirsa pesendkirina biryarnameyekê di vê derheqê li dijî Îranê di destûra karê civata ewlekar ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî de heye. Ger ev biryarname bihê pejirandin, destê civaka cîhanî ji bo sizadana Îranê vala û vekirî dimîne. Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê encama siyaseteke wiha çawa dinirxîne?**

**M.H:** Eva cara yekemîn nine ku Komara Îslamî yasa û peymanên navneteweyî binpê dike û li berçav nagire, belkî her li destpêka hatine serkara xwe ku nêzîk bi 27 sala ye, her bi vî awayî dilive. Lê niha ku ev rejîme hêdî hêdî ji çêkirina çeka Etomî nêzîk dibe û cîhan û bi giştî Rojava xwe di tirs û xofa van çekane de dibînin, dengê wan bilind bûye û qala cezadana vê rejîmê anîne rojevê. Her çend heya niha ji ber dijberiya du endamên hertim yên Civata Ewlekariyê (Çîn û Rûsiya) tevî cezadana vê rejîmê, nahê çavnihêrî kirin ku di rûniştina vê carê ya vê civatê de, sizayek wiha bo rejîmê bihê diyarî kirin. Lê em bawer in ku di pêşerojê de ev sizaye dê bihê diyarî kirin. Çûnku Komara Îslamî pê li ser xurtkirina vê bernameyê de çeqandiye û nemaze bi tekez û gotina dostên xwe jî dest ji pirojeyê ber nadet.

Me jêve ye ku kiryarên Komara Îslamî li hindur û derveyî welat, bi taybetî veşartina rastiyên derheqî prosesa Etomî di saziya Vejena Etomî bo midehê nêzîk bi 18 salan bûye sedema vê yekê ku civaka cîhanî hitbarê bi rejîmê neke û ji bidestxistina çekên Etomî nigeran be. Lewra em encama her terze ziyan û zirarekê ku sizayên aborî yan her sizayek din ku bi ser xelkê Îranê de bişkêt dixine stûyê rejîmê.

**Çend roj e ku bi giştî hemû jêderên nûçeyan qala nivîsîna nameya Ehmedînejad Serok Komarê Îranê ji bo Bûş, Serok Komarê Amerîkeyê dikin. Hûn vê nameyê di vê rewş û zirûfê de çawa dinirxînin?**

**M.H:** Li midehê hemû jiyê Komara Îslamî de geva ji aliyê nawendê biryarên navneteweyî ew rejîm ketiye bin zext û givaşê, ji bo betalkirina vê givaşê û bidestveanîna dema zêdetir ji bo domandina siyaset û kiryarên xwe, yek ji berpirsiyarên rejîmê nameyek nivîsandiye yan jî axaftinek kiriye û mixabin di vê derheqê de karîne serkeftî bin û cîhanê bixapînin.

**Hûn bawerin ku Amerîka her vê siyaset û metodê ji bo çareseriya pirsgirêkên xwe tevî Îranê dişopînin ku di Îraqê de meşandin?**

**M.H:** Ger rojekê Amerîka yan civaka navneteweyî bi giştî bigihîjne vê encam û qenaetê ku rejîma Îranê biguherînin, pîvan û bingeh ne eva ye ku her vê metodê bi kar bînin, ku di Îraq yan Efxanistanê de bi kar anîn, belkî zaf metod û rê cihên din hene ku dikarin mifahê jê bistînin. Bi taybetî ku niha xwediyê hin ezmûn û ceribînan in ku li dema êrîş bo ser wan du welatan bi taybetî Îraqê de bi dest xistine.

**Ezmûn û ceribînên Îraqê bi giştî û bi taybet prosesa cîgirkirin û pêşvebirina demokrasiyê û avakirina sîstema federalî, bandor û cihwara xwe li ser rewşa giştî a deverê û welatê me jî didanêt. Bi li berçavgirtina vê çendê ku Îran welatek pir neteweyî, pir çand û pir meseb e, gelo terz û modêla niha ya Îraqê ji bo parvekirina desthilat û çareseriya pirsa neteweyî û cihgirkirina demokrasiyê bo Îranê jî bi modêleke baş dizanin?**

**M.H:** Em baştirîn metoda birêvebirina desthilatê di Îranê de bi Federalîzmê dizanin ku li ser bingeha Coxrafî – Neteweyî bihê ava kirin. Bi taybetî ku çendîn neteweyên cuda pêkhateya nifûsa Îranê pêk tînin. Merema me eva ye ku neteweyên bindest yên Îranê û yek ji wan kurd ji vê çendê zêdetir nehên çewsandin û li bin zulm û sitemê de nahên ragirtin, belkî di rêvebirina deverên akincî bûna xwe û di seranserê Îranê de wekî hev bin.

Eva çareseriya pirsa neteweyî di Îranê de ye û

demokrasiya rastîn jî bi vî awayî misoger dibe. Bê şik di vê metoda parvekirina desthilatê hewceye zirûfa seranserê Îranê û her neteweyekê bihê li berçav girtin. Bi vî awayî merc jî nine ku her modela Îraqê yan her welateke din yê Federalî bihê peyrew kirin. Çunku rewşa Îraq û Îran ferq heye.

**Bizaveke pan û berfireh a xelkî û sivîl di Kurdistana Îranê de di rojevê de ye. Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê wekî hêza sereke û pêşengê xebata gel, çi tiştekê ji vê bizavê hîn dibe? Çi hîn dike? Çawa karîgeriyê li ser didanêt? Gelo Partiyê çi bernameyek ji bo birêxistina hemû hêz û şiyanên cur bi cur di nava civaka kurdewarî bona berfirehkirin û bi coş dana pitir a xebata rizgarîxwaz a xelkê Kurdistanê heye?**

**M.H:** Rast e, ev bizave di rojevê de ye û PDK Îranê jî zanyarî li ser de heye û bawerî jî pê heye û lewre ye ku têde pişikdar e, kargeriyê li ser didanêt û kargeriyê jî lê wedigre û bi vî awayî pêre diçe pêş. pêka pêşdeçûnan jî taktîkên xwe diguhere û bi awayekê ku bikare xwe tevî bizavê hevaheng bike û pêşengiya wê jî her di dest de hebe. Ger em lênihêrînekê ji cehd û têkoşîna Partiyê ji bo van guhartinên taktîkî bi taybetî piştî Kongireya Sêzdehem bikin, dê bibînin ku çiqas guhartin li metoda dîplomasî, ragihandin û teşkîlatê de hatine kirin. Ez vê yekê jî bibêjim ku partiyê nekariye hemû wan guhartinane ku armanca wê ye di taktîkên xwe de pêk bûne. Ji ber vê ku me li hindurê Kurdistan û dereve de berbendên zor li pêşiya xwe de hene û van berbendane jî di zaf waran de çarçoveya xebata me berteng kirine, lê li gor şiyana xwe me ev kare kiriye û dê her bidomînin.

**Di hin cihên Kurdistana Îranê, Kurd û Azerî bi hevre ne û li cîranetiya hev de dijîn. Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê çi bernameyek bo van deverane heye ku Kurd û Azerî bi awayekî aştiyane bi hev re bijîn?**

**M.H:** Kurd û Turk bi dirêjahiya sedan salan di parek ji cihên akicîtiya xwe de pev re jiyane. Di vê midehê zaf serpêhatiyên tal û şirîn bi hev re hene. Hewceye bi ders û ezmûn wergirtin ji hemû van bîranînane, her du alî bîr ji bi hev re jiyaneke aştiyane û şaristaniyane bikin.

Partiya Demokrat di vê derheqê hertim bîr ji peydakirina vê terze jiyanê bo her du neteweyan kiriye û rêçareya dijberiyan jî destnîşan kiriye.

Mînakên baş û serkeftî di vê derheqê de ev yasayane bûn ku li dema Komara Kurdistanê û Hikûmeta Millî ya Azerbaycanê de pê diliviya. Divêt di pêşerojê de jî me bi hevkariya Turkên Azerbaycanê bernameyeke pêşketî hebe.

**Nameyek ku Dr. Elîriza Nezmî Efşar bo cenabê te nivîsandibû û we jî bersîva wê daye, hinek pirsyar û bas anîne pêş. Pirsyar eva ye ku navhatî di nameya xwe de bêhurmetî bi Simkoyê Şikak dike û amade jî nine ku rastiyan bipejirîne, ku wisaye çawa dibe cenabê te bersîva wî bidin? Bo divêt em gotûbêjê tevî nûnerên nasiyonalîzma Azerî bikin?**

**M.H:** Piştî hevpeyvînekê ku wê demê di rojnameya "**Kurdistan**" de hatibû weşandin, tehrîkeke zaf di nava Turkên Azerî û tundrew û dijî Kurd ên vê parêzgehê de pêk hat. Dr. Nezmî Efşar ku pêwendiyeke mêjdemî tevî Partiya Demokrat û min bi xwe heye, ew name ji min ra şand û min jî bersîva wî da û diviya herwiha jî ba, li ser vê nameyê û bersîva wê hewce ye ez bêjim ku:

Yekem: Ew namane taybetî bûn û nedibûn bihên belav kirin, eva jî ku Dr. Nezmî Efşar weşandiye karek baş û ne bi cî nine.

Duyem: Ewa ku nameya min bi merema aramkirina rewşê bûye û min nexwastiye ku biçim ser yek bi yeka van xalane ku di nameya navhatî de hatibûn, eva jî bi vê wateyê nine ku min xal bi xala vê nameyê pejirandibe, her wekî ku ev û Turkên din jî raya wan li ser zaf pirsan mîna me nine. Lewra em nikarin û nabe jî bi wan biselmînin ku Simko mirovek niştimanperwer bûye û ew jî nikarin bi me bidin selimandin ku Simko rêgir ... bûye. Belkî em dikarin li ser çend xalên havbeş ku berjewendiya her du aliyan têde bin li niha û pêşerojê de bi hev re bijîn û pirsên xwe çareser bikin. Hunera me wekî partiya Demokrat û hemû Kurdên rastbîn ku hest bi berpirsiyariyê dikin di peyda kirina wan xalên havbeş de ye, eva jî karek girîng e ku hewcehî bi demeke zor û bas û gotûbêjên dirêjheyam heye û di dema xwe de divê bihê kirin, ku niha dema wê nine û hemû neteweyên bindest di Îranê divêt şiyar bin û li bîra wan neçe ku dujminê sereke yê me Komara Îslamî ye û dujminê din ji bo xwe ne afirînin. Çunku dema ku valahiyek derkeve rojevê, Komara Îslamî dê bi başî bi qazancê xwe mifahê bistîne.

Di vê derheqê de ez dibêjim ku ger em hest bi berpirsiyaryê nekin, zor hêsan li Ewropayê birûnên û me çi pê xweş be em bibêjin, lê heke em hest bi berpirsiyaryê bikin, gava ku bas ji meseleya Azeriyan dikin, divêt em bîr ji rewşa xweşk û biryarên xwe ku rûniştiyên Azerbaycanê ne dikin. Kurd û Turkên tundajo zaf malwêranî bo her du aliyan, pêk anîne. Lê axaftina min wekî Sekreterê Giştî yê Partiyê tevî peyivîna wan kesane ferq û cudahî heye. Çunku divêt ez bîr ji qazanc û berjewendiya gelê xwe bikim û bipeyivim ne bi hêvî û xwasta dilê xwe.

**Eva ku cenabê te gotiye, evaye ku divêt em bi hev re bi aştî bijîn û di proseya cihgirkirin û xurtkirina demokrasiyê de xebatê bikin, mafên rewa yên hev qebûl bikin û formek jêhat û hevçerx ji bo çareseriya pirsan peyda bikin û mifahê ji ezmûnîn welatên cur bi cur yên din wergirin. Ji aliyê hin kesan ve bi bexşîna xaka Kurdistanê bi Azerbaijan tê rave kirin. Hûn dikarin li ser vê meseleyê zaftir rawestin ku çawa şirove yeke wiha li ser axaftina cenabê te hatiye kirin? Merema we çiye? Kakila axaftina cenabê te di vê derheqê de çiye?**

**M.H:** Axaftina min bi tu terzekê şirove û tefsîreke wiha lê nahê kirin, ez ew kes yan kesane jî nas nakim ku şiroveke wiha li axaftina min kirine û nizanim ku bi xwe çend salan di rêya Kurd û Kurdistanê de xebat kirine ku niha wiha bi hêsanî tawana Kurdistanfiroşiyê li kesekê dixin ku zêdetir ji çarêkek ji sedsalê ye di vê rêyê de fidakariyê dike?

**Li van cihane ku peyrew û alîgirên çend netewe, ol û meseb bi kultur û zimanê cuda bi hevre dijîn, qala wê tê kirin ku pêwîst e xalk bi ji hev têgihîştin, li ber çavgirtina û vêç û berjewendiyên rewa yên hev, tolêranse, ji hev têgihîştina çandî, Ploralîzma çandî, siyasî û zimanî, bi hev re jiyana bi aştiyane, rêzgirtin ji bihayên demokratîk û mafên mirovan û aştîxwazane bihên perwerdekirin. Ceribînan daye eyanê ku înkarkirina kesek, neteweyek, kêmaniyek ... ne mimkun û ne jî tu xêr û xweşî li peyre ye. Gelo baştir nine li van cihên ku Kurd û Azerî bi hev re dijîn, zarok bi vê yekê bihên perwerdekirin ku pêşerojek hevbeş hene, li cihê wê ku fêr bibin ku hev nedîtî (nadîde) bigirin?**

**M.H:** Bêşik niha serdema dîtina rêyên çareseriya asteng û pirsgirêkan, diyalog û ji hev fêmkirinê ye. Ger em nekarin diyalogê weke kultur bikin kilîla kosp û astengên xwe û penayê bibin ber tund û tûjiyê, ne tenê tevî Azerî û netewên din yên Îranê ku bi hev re dijîn, em nikarin di aştiyê de bijîn, ji ber ku em tevî xwe de jî nikarin bi hav re bijîn û roj bo roj arîşe û giriftên me dê zêdetir bibin. Diyare eva ji bo aliyên din ger Tukên Azerbaycanê yan neteweyeke din jî be, rast e.

# Pirosesa Cîhanîbûnê Û Têkiliya Navbera Çandên Netewan

**Hoşeng Kerem Tacir - Mako**

Pêşveçûnên ku di hemû warên jiyanê de, nemaze ji aliyê civakî û çandî de derketine holê, gelek sînorên ku ji aliyê hêzên desthilatdar li ser civakê de hatine pêk anîn, bê bandor dike. Yanî mirov dikare bibêje ev yek sînora radike û di encama wê yekê de jî têkiliyên çandî û civakî bi awayekî otomatîk di navbera gelan de pêş dikevin.

Bêguman pêşveçûnên ku îro di asta teknîk û teknolojiyê de derketine holê û her wisan destkevtên wê, gelek ji şoreşên ku heta niha hatine pêk anîn, zêdetir e. Yanî em behsa şoreşan dikin, divêt ev yeke were zanîn ku di naveroka her şoreşekê de, yanî di heman cevher û kakila wê de guhertin heye, yanî şoreşên heta niha di dîroka mirovan de hatine çê kirin, ji bo hilweşandina nîzamên kevin û anîna nîzameke nû ye, yanî ew dixwaze bi rêbazên cuda cuda sîstem û hizrek nû bi xwe re bîne, lê belê em baş dibînin ku îro teknolojiyê bi xwe şoreşek mezin di navbera mirovan de pêk aniye.

Yanî em li vira bidestxistiyên şoreşên mirovî heta niha hindik nabînin û li hember wan bêrêziyê jî nakin. Lê em li ser vê yekê bisekinin ka em çawa bikarin di dunyaya niha a pêşkevtî da ji mîrasên şoreşan xwedî derbikevin. Bêguman eva gelek girîng e û di pirosesa nû ya cîhanî de hewce ye gelek nîqaş û analîzên zanistî em li ser wê çê bikin.

Em baş dibînin ku şoreşa teknîk, înternet û wd... gelek xizmetê ji me re dike û bandora wê li ser jiyana me her roj zêdetir dibe û bi xwe re guhertinên mezin çê kirine. Ew guhertin tenê ji aliyê teknîkê de nemaye, belkî bandora wê li ser hizr û jiyan û çanda me gelek diyar e. Niha di vê rewşê de hewceye em çi bikin? Gelo em wek Îslamiyên radîkal û paşverû li hember wan de bisekinin û wekî Îranê û zaf dewletên din qedexeyan bidin ser însanan? Ku encama wan qedexeyan îro ji me hemûyan re aşkira ye. Hewce ye em vê yekê bibînin ku guhertin îro li roja me da wek pêlên avê xwe gehandiye hemû deverên jiyanê û li bingeh da her mirovek wê yekê dibîne û ji destkevtên û berhemên wê mifahê distîne.

Xala sereke û ya girîng di vê pirosesê da eva ye ku teknîk û ew guhertin bi xwe re çandekî taze tîne û bandorê li ser civak û her mirovekê datîne. Her çend ku îro gelek kes di pirosesa cîhanîbûnê de pirsa neteweyî zêde berçav nagirin, lê divêt em baş bizanin ku her neteweyek bi hebûn û rengê xwe, bi ziman û çanda xwe di wê pirosesê de hebûna xwe diyar bike û ji pêşveçûnan, bo pêşvebirina çanda xwe bikar bîne, ne ku di nava wan pêşveçûnan de were helandin.




Îro û di vê rewşa han de pêwîst e ku em wek gelê Kurd di nava wê pirosesê de ku her roj rengek cuda bi xwe digire û pêş diçe cihê xwe bigirin û ji netewe û çandên din yên cîhanê ku nîva çanda me dewlemend ninin, paş nemînin. Çawa dibe ku kaniya çand û gelek kulturan paş bimîne! Kê berpirs yarê/a wê yekê ye? Ji bo piraktîzekirina wê yekê hewce ye ku di destpêkê de zana û ronakbîrên Kurd bi bê ji berçavgirtina wê yekê bilivin û li ser rastiyan îsrarê bikin û li hember bizava paşmayî ya ku wekî pence şêrê civaka me dixwe û bi hemû hêz û şiyana xwe şer bikin û nebin beşek ji wan.

Her wekî me li jor diyar kir, gava sereke û bingehîn ku kilîta gelek pirsan vedike, şerkirin li hember hizra kilasîk û paşmayî di nava civakê de ye û eva wezîfe û erka her ronakbîrekê ye ku wî navî li ser xwe datîne.

**Çalakî û hevdîtinên Sekreterê Giştî yê PDK Îranê li welatên Norwej û Almanya**

Di meha Maya 2005'an de, Birêz Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê seredana her du welatên Norwej û Almanyayê kir û gelek hevdîtin û çalakiyên girîng yên siyasî tevî perêzî û kesayetiyên siyasî û rayedarên partiyên siyasî ên wan welatan re pêk anî.

Her wiha kekê Mistefa Hicrî ji bo axavtin li ser rewşa Kurdan li Îranê û wd... ji bo Amerîkayê hatiye vexwendin.

Xwendevaên hêja dikarin nûçe û raporên berfireh ên hevdîtin û çalakiyên Sekreterê Giştî yê PDK Îranê di malpera me de bixwînin.

# Di Xwenîşandana Nexedê De 8 Kes Hatin Kuştin



Roja pêncşem, 25.05.2006'an, ji bo hevdengî û hevxemî a Azeriyên din yên Îranê, niştecîyên bajarê Nexedê yên Kurd û Azerî bi hev re xwenîşandan ek bi dijî siyasetên qirêj yên Komara Îslamî û sivikatî kirina Rojnameya "IRAN" bi Azeriyan re, pêk anîn.

Di pêvajoya xwenîşandanê de şer û pevçûn di navbera xelkê nerazî û hêzên dijî gelî yên rejîmê de çêbû ku di encam de hêzên rejîmê teqe li xelkê kirin û 8 kes kuştin.

Navê 5 kes ji kuştiyan wiha hatiye zanîn:

1. **Tewhîd Azeriyan**
2. **Esker Qasimî**
3. **Himet Îsmzade**
4. **Husên Fethîpûr**
5. **Kesek bi navê Rezewî**

Hêjayî gotinê ye ku termê kuştiyan hatine veşartin û ji malbatên wan re nahên dan.

Her wiha Melayê kevneperest "Hesenî", ku ji bo aram kirina xwenîşandanê çûbû Nexedê, li dema axavtinê de kete ber êrîşa xelkê û revî.

Şûnewarên weke navenda hêzên Întizamî, Bankên"Milî"(17ê şehrîwer), "Ticaret" û "Rifahê Kargeran" û parek ji zanîngeha Nexedê û çend otombêlên hêzên rejîmê di encama êrîşa xelkê nerazî de hatin şewitandin.

Di wê navberê de kirêgirtiyên rejîmê ji bo ku şer û nexweşiyê bixin navbera Kurd û Azeriyan û xelkê bixapênin, kuştina wan 8 kesan xistine stûyê Kurdan. Ev pîlana rejîmê li demekê de ye ku di bajarên din de jî Kurd û Azerî bi hevre rijiyane ser şeqaman û bi dijî siyasetên rejîmê xwenîşandan lidarxistine. Divêt ku em baş bizanin siyaseta Komara Îslamî dijayet tevî hemû neteweyên Îranê ye û her tim hewil daye ku di navbera wan de bi taybet navbera Kurd û Azeriyan de şer û nexweşiyê pêk bîne. Bê guman yekîtî û hevxebatiya Kurd û Azeriyan dikare siyasetên qirêj yên Komara Îslamî a Îranê betal bike.

www.arsivakurdi.org

# Sîbera Tarî Ya Mêr Serdestiyê Pirsgirêka Mezin Ya Jinên Kurd

**Dr. Roya Tilûeî**

Îran welateke pir netewî ye ku neteweyên Kurd, Azerî, Fars, Ereb, Belûç, Turkmen û Lor di çarçoveya ne demokratîk a siyasî ya wê de dijîn û serbarê vê ku di bin sîbera hikûmeteke siyasî a dîktator de dijîn, her yek ji wan neteweyane taybetmendiyên çandî yên taybet bi xwe hene.

Kurd jî weke hemû neteweyên din di Îranê de, xwediyê çand û derbasbûyiya taybet bi xwe ye û niha jî di çaxê cîhanîbûnê de, weke hemû neteweyên din berengarê derbazbûn ji kevneşopiyê ber bi aliyê modernîteyê bûye. Bê şik di vê derbazbûnê de pirsa jinê yek ji pirsgirêk û pirsên herî mazin e ku her çandek tevî vê berengar dibe.

Bi sedema vê ku di Îranê de geşekirina aborî û civakî û ... bi terzeke wekhev belav nebûye û hin herêmên weke Kurdistanê bêşik mifaheke kêmtir ji geşekirina aborî hebûne. Her çend ku bajarên mezin weke Tehranê ceribînên mezintir û cur bi curtir ji livîn ber bi aliyê modernîteyê ve hene, lê herêmên weke Kurdistanê hertim kevneşop û geşenekirî mane û ew pêkhateya kevneşop û pirsgirêkên taybetî bi wê roleke berçav di zêdebûn û xurtbûna pirsgirêkên jinan de dilîze.

Di serdema cîhanîbûnê, pêwendî û teknolojiyê de tê xuya kirin û bizava jinên cîhanê ji bo bidestxistina mafên wekhev tevî mêran, weke bizaveke xwedî nasname û zindî ye û bahoza wê bizavê hemû welatên cîhanê xistiye bin bandora xwe.

Bê şik jinên Îranê jî yê ketine bin bandora wê bizavê û nemaze deverên herî kevneşop yên Îranê jî ketine bin bandora vê bizavê. Cuda ji vê çendê, jinên Kurd yên li Kurdistan û Ewropayê çalakiyên ektîv û bibandor hene ku ewa jî bi xwe mijareke din ji bo nasandina tevgera wan dixwaze.

Hêjayî gotinê ye ku tevgereke çandî di Rojhilata Kurdistanê de heye ku di vê tevgerê de jin û mêrên ronakbîr, mamosta, xwendekar, rojnamevan, nivîskar, helbestvan û hunermend pişikdar in. Di vê navberê de jinên ektîv yên Kurd jî serbarê vê ku di vê tevgera çandî de pişikdar in, mixabin divêt piraniya hêz û şiyana xwe bixine xizmeta xebat dijî mêr serdestiya zal bi ser civakê û bi taybet kevneşopiya zal bi ser hizr û ramana mêrên rewşenbîr. Mixabin destgihîştina jinan bi delîveyên wekhev pir kêm e, lê pişka jinan ji tepeserî û tund û tûjî û ne wekhevî û sexerbirinê bi terzeke bexşende mişe ye.

Hêj kesayetiya jinan weke kesayetiyeke serbixwe nehatiye naskirin û tu hitbar û baweriyek bi şiyan û hêza vê nehatiye kirin. Renge tund û tûjî dijî jinên ronakbîr tund û tûjiya fîzîkî nebe, lê belê tund û tûjiya ruhî û bêmifah kirina jinan ji delîveyan ji aliyê mêran û tepeserkirina baweriya jinê hertim berdewam e û carnan bi heya û heysiyeta wan tê lîstin. Mixabin ev deste û girûp ji mêrên rewşenbîr ku îdiaya piştgirî ji mafê jinan dikin, demekê pişikdariya jinan dipejirandin ku li bin desthilata wan de bin û ger wisan nebe, hemen ev kesane bêrehmanetirîn tund û tûjiyê bi dijî jinan bi kar tînin.



**Hêj kesayetiya jinan weke kesayetiyeke serbixwe nehatiye naskirin û tu hitbar û baweriyek bi şiyan û hêza vê nehatiye kirin**

Pirsgirêka jinên ektîv di warê siyasî de zêdetir e. Ev jinane divêt şeref û heysiyeta xwe û malbata xwe danêne ser destê xwe û amadeyî her terze bêhurmetî kirinê bin. Mixabin jin di Komara Îslamî de di çaxê hilbijartinan de bi tundî tên tepeserkirin, ji ber ku hem desthilata mêr serdestiyê hêj di civakê de bi hêz e û sîbera wê ya bixof li ser hizr û ramanên mêrên ronakbîr hertim bandor heye û jinên ektîv naçar in ku bi dijî vê sîbera bixof xebatê bikin ku ev jî parek zor ji şiyana wan xisar dike. Eva di halekê de ye ku di derbasbûyiya dîroka vî xelkî de jinê ciheke bilind û bihagiran û hev astê mêran hebûye.

Di dawiyê de divê bihê gotin ku tiştê herî mezin ku zext û givaşan li ser jinan zêdetir dike, rejîma Komara Îslamî ye ku bi hezkerê mêr serdesiyê di civakê de ye.

**Werger: Meryem Hacîpûr**


# 75 Ji Sedê Ya Jinên Rojhilata Navîn Tevî Ne Wekheviya Kar Berengar Dibin

Zêdetir ji 75 ji sedê ya jinan di bersîva pirsa şîrketeke şol peyda kirinê di Rojhilata Navîn de, li ser vê baweriyê ne ku di dema peydakirina şolê de tevî ne wekheviya regezî berengar dibin.

Navenda “Bid” bi belavkirina berhema rapirsînê ragihand ku 44 ji sedê ya pişikdarên vê rapirsînê gotine ku carnan tevî ne wekheviya regezî û 34/5 ji sedê jî gotine ku hertim tevî vê ne wekheviyê berbirû dibin.

Li gor vê rapirsînê zêdetir jinên ku di beşa neft û Gaz de li dû şolê digerin, tevî vê ne wekheviyê berengar dibin.

Li gor rapora Rêxistina Neteweyên Yekbûyî, zêdetir ji 60 ji sadê ya jinan di şîrketên malbatî de dixebitin, lê tu miaş û heqdestekê jî wernagirin.



www.arsivakurd.org

## 20 Ji Sedê Ya Zarokên 6 Heta 11 Salî Di Îranê De Tên Îşkence Kirin



Berpirsê deftera Yûnîsefê di Îranê de got: Li gor lêkolîneke ku bi alîkariya Wezareta Saxlemî û Yûnîsefê li ser rewşa azardana zarokan di Îranê de hatiye kirin, zêdetir ji 20 ji sedê ya zarokên temen 6 heta 11 salî tên îşkence kirin.

"Kirîstîn Salazor Valkmen" zêde kir ku li gor vê lêkolînê pêtirî 9 ji sedê a zarokên 12 heta 18 salî jî tên îşkence kirin.

Her wiha berpirsê bîroya Yunîsefê da xuyakirin ku pirsa tund û tûjiyê bi dijî zarokan pirseke cîhanî ye ku ber bi zêde bûnê ve diçe ku divêt ev pirs bihê çareser kirin.

## Nûtirîn Serhejmarî Ji Tecawizên Cinsî Li Amerîkayê

Li gor nûtirîn serhejmariyên belavbûyî ji aliyê Pirtûkxaneya Civata Nojdarên Amerîkayê, di salê de 1500 zarok di vî welatî de dibine goriyên tecawizên cinsî.

Herwiha di salê de zêdetir ji 140 hezar zarok di tecawizên cinsî de birîndar dibin û bi giştî di salê de 1/7 milyon tecawiz di Amerîkayê de diqewimin.

Herwiha ev serhejmariye dide xuya kirin ku ji her 4 jinên Amerîkayê yek jin di zarokiya xwe de tevî tecawiza cinsî berengar dibin.

Ev serhejmariye dide xuyakirin ku di salê de 1100 zarok bi sedema xurtiya tecawizên cinsî jiyana xwe ji dest didin û ji her 7 mêrên Amerîkayê yek mêr jî berî temenê 18 saliyê tevî tecawizên cinsî berengar dibin.

# Mirina Kesekê Bi Sedema Teqîna Mayînê



Roja înê 12.05.2006'an kesek 35 salî bi navê Mihemed Hacî Xidirî xelkê gundê Kone Mişka bajara Serdeştê bi sedema teqîna mayînekê canê xwe ji dest da. Li gor gotinên şahidan, zexta teqîna mayînê bi qasekê giran bû ku hemû parên bedenê wî ji hev belav bibûn û navhatî di halekê de hate veşartin ku hin parên laşê wî nehatin peyda kirin.

# Jin Û Zarok Mezintirîn Goriyên Qaçaxa Mirovan Di Cîhanê De Ne



**Jin û Zarok goriyên bingehîn yên qaçaxa mirovan di Cîhanê de pêk tînin**

Nûçegehaniya Firansayê ragehand: Rêxistina Neteweyên Yekbûyî di di rapora xwe de derberê madeyên bêhişker xuya kir ku jin û zarok yekemîn goriyên qaçaxa mirovan di cîhanê de ne û tu welatek di cîhanê de ji pêvajoya qaçaxa mirovan bi dûr nemaye.

Rapor dide xuya kirin ku 12 welat bi taybetî di Asiya û Rojhilata Ewropayê de, weke welatên bingehîn yên qaçaxa mirovan tên hesibandin.

Her wiha 77 ji sedê ya dosya qaçaxa mirovan, pêwendî bi jinan û 33 ji sedê pêwendî bi zarokan û 9 ji sedê pêwendî bi mêran heye. Eva di halekê de ye ku mifah wergirtina xirab ya cinsî, armanca bingehîn ya gaçaxçiyan e ku 87 ji sedê a nimûneyên qaçaxê pêk tîne û para din jî pêwendî bi armancên din weke karê neçariyê heye

## Belavkirina Wêneyên Jinan Di Rojnameyên Erebistanê De Hate Qedexekirin



Melik Ebdula daxwaz ji sernivîskarê rojnameyên welatê xwe kir ku wêneyên jinan bi sedema vê çendê ku mêrên ciwan dixapînin belav nekin.

Melik Ebdula, Paşayê Erebistanê piştî rûniştin tevî sernivîskarên rojnameyên welatê xwe got: "Tenê em dibe bala xwe bidin ser tiştekê, ev jî ewa ye ku gelo hûn jî dixwazin ku wêneyê xûşk û keç û jinên we bi vî awayî bihên çapkirin? Ku helbet kes vê yekê naxwaze."

Hêjayî gotinê ye ku çend rojnameyên Erebistanê heyamekê berî niha wêneyên jinên ku lixwekirina wan vekirî bû, çap kiribûn.

BI ZİMANZAN SAMÎ TAN RE, HEVPEYVÎNEK Lİ SER REWŞA EDEBİYATA KURDÎ

# "Dİ HİŞYARBÛNA MILETAN DE, ZİMAN ROLEKE SEREKE DİLÎZE"

**Samî Tan kî ye?**

*Ez di sala 1965'an de li gundê Axçeliyê yê Kolika Semsûrê ji dayik bûme, lê malbatê di sala 1974'an de bar kiriye çûye Çukurovayê. Min dibistana seretayî, navîn û lîse li Mêrsînê xwendiye. Min li Zanîngeha Bogazîçî Beşa Dîrokê xwendiye, lê min nebiriye sêrî. Ji sala 1993'yan heta dawiya sala 2004'an ez di rojnameyên mîna Welat, Ozgur Ulke, Welatê Me, Azadiya Welat, Pîne û Ajansa Nûçeya ya Dîcleyê de xebitîme. Min demeke dirêj gerînendetiya giştî ya weşanê ya Azadiya Welat kiriye.*

*Pirtûka min a yekemîn Waneyên Rêzimanê Kurmancî di nav Weşanên Welat de sala 2000'î derket. Xebateke min a mîzahî bi navê "Beranê Enîbeş- Şer giran e, ne karê henekan e" di nav weşanên Aramê de hatiye weşandin. Her wiha min salên 2003 û 2004'an de di nav organîzasyona Rojên Edebiyatê li Diyarbekirê de cih girt. Pirtûka Konferansa Ziman a 2004'an min amade kir.*

*Wekî din digel Zana Farqînî û Hesen Kaya me bûroşek ji bo danasîna zimanê kurdî amade kiriye. Digel Maşallah Dekak jî min li ser nûçegihaniya kurdî bûroşek amade kir. Ez niha di rojnameya Azadiya Welat û Kovar Zend û malperên Amîdakurd û TZPKurdî de dinivîsim. Ez niha Serokê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê û aktîvîstê TZPKurdî me.*

*L. EPOZDEMİR*: **Rewşa Edebiyata kurdî, îro beramber bi salên 80 çawan e. Li Turkiyê ku şertên nivîsandina bi kurdî pariyekî azad bûne, çi fersend daye pêşketina edebiyatê. Gelo em dikarin bibêjin ku xwendin û nivîsandin yekser dimeşin yan na..?**

***S. TAN:*** Mirov dikare bibêje di warê edebiyatê de li gorî salên 80'yî pêşketineke berbiçav heye. Niha ne hejmareke pir zêde be jî, di warê helbestê de hin helbestvanên xurt derketine holê. Her wiha di warê kurteçîrokan de hinek berhem derketine. Gelek kesên ku berê kurteçîrok dinivîsandin, îro dest avêtine romanan.

Di roja îroyîn de astengiya herî mezin a li ber edebiyata kurdî, nebûna bazara kurdî ye. Hê jî wekî Ehmedê Xanî gotî, "Bazar kesad e, ji qumaş re nîn e xerîdar". Ji ber tengbûna bazarê weşanxane nikarin pirtûkan çap bikin, her wiha kovarên ku bibin warê pêşketina edebiyatê jî kêm in. Kovarên heyî jî ji ber heman pirsgirêkê zehmetiyê dikêşin.

**Hevpeyvîn / Letîf Epozdemir**



Sedemeke bingehîn a tengbûna bazara zimanê kurdî, ev e li Bakur destûr nehatiye dayîn ku kurdî (kurmancî û kirmanckî) bibe zimanê perwerdehiyê. Niha mafê ku rejîmê daye kurdan e ev e; "ez kurdî nakujim, lê nahêlim ku bijî jî, ez mafê xwekujiyî didim kurdî û hw". Divê kurd li hemberî vê yekê ji bo ku statûya zimanê xwe bilind bikin têkoşin, serê pêşîn jî divê rê li ber perwerdehiya bi zimanê kurdî vebe.

**"GELEK CARAN, NİVÎSKARAN, HÊVÎ Û DAXWAZA GEL Lİ BER ÇAV NEGİRTİNE. LEWRA GEL JÎ GUH NEDAYE BERHEMÊN WAN"**

*L. EPOZDEMİR:* ***Di*** **dîrokê de gelek caran rewşenbîrên kurd sedem şert û zirûfên nexweş, mecbûr mane ku koçebar bibin û herine derveyî welêt. Her wiha li derveyî welêt berhemên xwe amade kirine. Edebiyatê di salên dijwariyê de li derve xwe parastiye. Sirgûn û xerîbiyê çî tesîrek daniye ser edebiyata kurdî.**

***S. TAN:*** Wekî hemû gelên bindest, gelê me jî ji ber zilm û zora dagirker mecbûrî penaberî û koçberiyê bûye. Vê yekê mîna hemû warên jiyanê û berhemên gel, bandora xwe li ser wêjeya kurdî jî kiriye. Ev bandor dualî ye; aliyek erênî ye, aliyê din jî neyînî ye. Aliyê erênî, mirovan kariye di mercên hê azad û demokratîk de xebatê bikin, her wiha wan derfet dîtin ku ji wêjeya cîhanê sûdê wergirin. Lê li aliyê din wêjekarên penaber ji rastiya civaka xwe qut bûne, her wiha ji bazarê jî bêpar mane. Hin caran rewşa penaberiyê zêde bandor li jiyana wan kiriye, tiştên ku xîtabî gelê kurd nakin jî hatine afirandin. Ji ber gelek cara nivîskaran hêvî û daxwazên gel li ber çavan negirtine, gel jî guh nedaye berhemên wan.

*L. EPOZDEMİR*: **Îro jî navenda edebiyatê xerîbî ye yan êdî edebiyat dikare li ser axa xwe şîn bibe? Nîvîskarên kurd lazim e çi bikin ku edebiyat zêdetir li ser axa xwe xurt bibe.**

***S. TAN:*** Piştî cûntaya leşkerî gelek rewşenbîrên kurd mecbûr bûn ku derkevin derveyî welêt, lewre jî demeke dirêj dilê wêjeya kurdî li Ewropayê dil avêt. Nemaze jî kurdên Swêdê karekî baş ji bo ziman û wêjeya kurdî kir. Her wiha piştî salên 1990'î derfet çêbûn ku metropolên mîna Stenbolê ji nû ve bibin, warê xebatên rewşenbîriya kurdî. Gelek saziyên çandî û hunerî, weşanxane, kovar û rojname derketin. Navenda van xebatan gişan Stenbol bû. Li cihekî wekî Amedê derfetên van xebatan nîn bûn. Heke ez ne şaş bim, di salên 90'î de bi tenê kovara Govend li Amedê derdiket.

Lê ji sala 2000'î vir de li welêt derfetên xebatên çandî û wêjeyî pêk hatine. Festîvalên ku li gelek bajarên welêt çêdibin, nîşaneya herî berbiçav ên vê yekê ne. Di Rojên Edebiyatê li Amedê de nivîskar û rewşenbîrên ji çar parçeyên welêt ev çend sal in digihêjin hev. Her wiha li Başûr jî gelek xebatên bi vî rengî çêdibin û dîsa rewşenbîrên ji çar parçeyên welêt beşdariyê tê de dikin. Ligel vê yekê rojnameya Azadiya Welat, Beşa Kurdî ya DÎHA'yê, piştre jî Dema Nû navenda xwe bir Amedê.

Ligel vê yekê niha li Amedê Komeleya Nivîskarên Kurd, Kovara W li Amedê xebatên xwe dimeşînin. Ev jî nîşan dide ku derfetên xebatê li Amedê û li bajarên din ên Bakurê Kurdistanê pêk tên. Ji bo ku derfet zêdetir li ber wêjeya kurdî vebin, serê pêşîn aştî, aramî û azadî pêwîst in. Di mercên şer û pevçûnê de wêje bi pêş nakeve, lê mixabin hêzên

www.arsivakurd.org

dagirker xwe nadin ber riya aştî û lihevkirin, lewre jî rewş her ku diçe xeteretir dibe. Ev yek jî nîşan dide ku ji bo pêşketina wêjeyê jî divê nivîskar û rewşenbîrên kurd ji bo aştiyê têbikoşin.

*L. EPOZDEMİR:* **Dengbêjî xaleke gelek girîng e di edebiyatê de. Her wiha edebiyata kurdî ya devkî dengbêjiyê rûmetek bilind hesab dike. Gelo dengbêjên kurd hetanî îro çî xizmet dane Edebiyatê**.

***S. TAN:*** Dengbêjiyê xizmeteke baş ji wêjeya kurdî re kiriye. Heta mirov dikare bibêje ku demeke dirêj dengbêj û çîrokbêjan wêjeya kurdî li ser piyan hiştiye. Hinek hunerên vegotinî yên di stranên dengbêjan de di kêm berhemên wêjeyî de peyda dibin. Her wiha wan zimanê kurdî jî heta îro li ser piyan hiştiye. Ji ber vê yekê em giş qerzdarê wan in. Divê wêjekarên kurd jî bi vî çavî li berhemên dengbêj û çîrokbêjan binêrin û li ser wan xebatên lêkolînî bikin. Her wiha zimanzan jî dikarin li ser zimanê wan xebatên bikin, gelek qalib û şayes, bêjeyên balkêş di stran û çîrokan hene. Lê mixabin hîn ferhengeke me ya berhevkirinê nîn e.

## " DENGBÊJAN ZEHMETEK MEZİN Dİ BER WÊJEYÊ DE KÊŞANDİYE"

*L. EPOZDEMİR:* **Tê gotin ku niştîmanperwerî bi edebiyatê dest pê dike. Roman, berhemek pir hêja ye di edebiyatê de. Her wiha, roman barkêşê gotara nîştimanperweriyê ye. Edebiyat û romana kurdî çî tesîrek li doza kurdayetî kiriye**.

***S . TAN*** **:** Mixabin roman di zimanê kurdî de cureyeke nû ya nivîsandinê ye, lewre jî bi qasî stran û helbestê bandorek nekiriye. Bo nimûne bi qasî stranên Şivan, Mihemed Şêxo, Aramê Tigran, Cegerxwîn û Qedrîcan bandora romanê nebûye. Dîsa jî me gişan Şivanê Kurd a Erebê Şemo xwendiye û jê bandor girtiye. Her wiha romana Îbrahîm Ehmed a bi navê Jiyana Gel jî tê bîra me gelekan, dîsa gelek nifşên nû Celadet Bedirxan bi romana Mehmet Uzun Bîra Qederê nas kiriye, her wiha Memdûh Selîm Beg jî bi Siya Evîn nas kiriye.

*L. EPOZDEMİR:* **Di Hişyarbûn û pêşketina mîlletan de rola ziman çi ye?**

***S. TAN :*** Di hişyarbûna miletan de rola zimên roleke sereke ye. Me gişan ji ber zimanê xwe fêm kiriye ku em kurd in. Lewre ji bilî zimên tiştekî din ku me ji miletên din cuda dike nîn e. Lê mixabin ev hişmendî hê jî tam di nav kurdan de cihê xwe negirtiye. Heta gelek kadroyên siyasî jî ev rastî tam fêm nekiriye, heke fêm kiribin jî vê rastiyê ew nexistine nava liv û tevgerê da ku zimanê xwe hîn bibin û hîn bikin. Tiştê ku hêzê dide pêvajoya xwepişaftinê (oto-asîmîlasyonê) nebûna vê zanîn û hişmendiyê ye.

*L . EPOZDEMİR:* **Pêwendiya ziman û raman, ziman û edebiyatê çi ye. Berhemên edebî, lazim e li gorî zimanên xwe yan li gorî kesayetiya nivîskarên xwe werin binavkirin**?

*S. TAN :* Derbirina ramanê bêyî zimên ne pêkan e. Her wiha ziman û edebiyat jî rasterast girêdayî hev in. Bêyî zimên pênasekirina edebiyatê pir zehmet e. Heçî pirsa nasnavê edebiyatê ye, ew pirseke dijwar e. Belkî ji bo kurdan mirov dikare, bibêje edebiyata kurdan û edebiyata kurdî. Lê ji bo vê yekê jî divê nivîskar xwe kurd bihesibîne, divê mirov bi darê zorê kesî neke nivîskarê/a kurd. Her wiha mirov kesî jî bi darê zorê ji kurdbûnê bêpar nehêle. Li aliyê din divê her nivîskarê/a kurd bizane ku xizmeta ji bo zimanê kurdî peywireke sincî û exlaqî ye.

## "ROMAN Dİ EDEBİYATA KURDÎ DE CÛREYEK NÛ A NİVÎSANDİNÊ YE"

***L. EPOZDEMİR:*** **Pirs û kêşeya yekîtiya elfabe û zaravên di zimanê kurdî de gelo dê çawa çareser bibe.**

***S. TAN :*** Li ser vê pirsê min gelek caran nivîsandiye, lê bi kurtî divê ez dîsa çend tiştan bibêjim. Pirsgirêka alfabeya kurdî niha maye li ser helwesta Hikûmeta Herêma Kurdistanê, ew dikare biryarekê bigire û bike ku gelê Başûr di demeke pir ne dirêj de derbasî alfabeya latînî bibe. Di vî warî meylek jî heye, hin gav jî têne avêtin, ew cihê kêfxweşiyê ye.

Meseleya zaravayan jî dîsa girêdayî desthilatiyê ye. Heke kurd bibin desthilatdar an jî dewletên ku Kurdistan dagir kiriye, helwesta xwe ya li hemberî kurdan biguhêrin, dê karibin zaravayên xwe berbihev bibînin; riya zimanekî hevpar di maweyeke navincî de vekin. Jixwe dema alfabe bibe yek û têkiliyên kurdan xurt bibin, wê demê pirsgirêka jihevtêgihîştinê dê zû çareser bibe. Lê serê pêşîn divê hemû zarava pêşî yekgirtina xwe pêk bînin. Dema vê yekê dikin jî zaravayên din li ber çavan bigirin. Her wiha di dibistanan de divê zaravayên cuda bêne fêrkirin da ku zarava nêzî hev bibin.

***L. EPOZDEMİR :*** **Xuyaye di edebiyata kurdî de, helbest zêdetir bi pêş ketiye. Çima? Helbesta klasîk a kurdî û ya nûjen bi çi şêweyî divê ji hev werin cudakirin, yanî çî ferq di navbera wan de heye.**

***S. TAN :*** Ji ber ku helbest awayê vegotinê yê herî kevn e û di kurdî de jî wêjeya devkî her tim xurt maye, helbest bi hêsanî bi pêş ketiye. Her wekî tê zanîn li Rojhilata Navîn awayê menzûm di nav gelên herêmê de jî awayê serdest e. Di medreseyên olî de jî awayên cuda yên helbesta klasîk bi pêş ketine. Ji ber vê yekê di medreseyên Kurdistanê de jî helbestvanên yekta yên mîna Meleya Cizîrî, Feqiyê Teyran, Elî Herîrî, Ehmedê Xanî derketine. Ew zêdetir ji dîwanên mîrên kurdan derketine. Helbestên klasîk û yên nûjen ji aliyê form û naverokê ve ji hev bi hêsanî têne cudakirin. Helbestên klasîk bi forma wezna arûz hatine nivîsandin, naverok jî li gorî bîr û baweriyên wê demê ye.

Heçî helbestên nûjen in, ew jî li gorî serdeman ji hev cuda dibin. Bo nimûne helbestên Cegerxwîn, Osman Sebrî naşibin helbestên helbestvanên îro yên mîna Rojen Barnas, Kemal Burkay, Rênas Jiyan, Ehmed Huseynî… Lê tiştek heye ku helbesta nûjen zêdetir an wekî helbestên Cegerxwîn bi kêş û rêzbend in, an jî wekî yên Rênas Jiyan serbest in. Her wiha mijar jî li gorî jiyana îro ye. Evîn, jiyana xwezayî, felsefe û herî zêde jî welatparêzî di van helbestan de balê dikêşin.

## "PÊDİVİYA KURDAN Bİ SAZİYEK NETEWEYÎ HEYE"

*L. EPOZDEMİR:* **Xebata di warê ziman û gramera kurdî de bes e yan na. Hewcehî îro zêdetir bi çî heye? Gelo mimkûne ku di ayendeyê de ( di rojên pêş de ) ferhengek mezin ku ji hemû zarav û devokên kurdî pêk hatiye çêbe. Ji bo vî karî lazim e çî were kirin, ev wezîfeya girîng lazim e ji aliyê kê ve were pêkanîn?**

***S. TAN :*** Xuyaye ku ne bes e, ji ber ku hê kêm tişt hatine kirin, gelek warên ziman û rêzimana kurdî nebûne warê lêkolîn û lêgerînê. Bi çavekî lîngûîstîkî lê nehatiye nihêrtin. Tiştê herî pêwîst niha pêdivî bi rênûmayeke rastnivîsê ango klavûza rastnivîsê heye. Her wiha jî pêwîstî bi ferhengeke kurd bi kurdî heye. Pêdiviya kurdan bi saziyeke neteweyî heye, lê mixabin, di vî warî de tu hewldanên berbiçav jî nîn in. Hê jî em bi çavekî hizbî li zimanê xwe dinêrin, lewre jî xebat ber bi hev nayên.

www.arsivakurd.org

# ZIMAN Û ZEMAN

**ADAR JIYAN**
adarjiyan@mynet.com


Zimanê civaka ku xwediyê feraset û perwerdehiyeke zanistî be û girêdayî vê feraset û perwerdehiyê sinc, tevger û hewldanên zanistî lê hebe, teqez dibe xwediyê ziman û ramaneke zanistî jî. Her wiha pêwendiya navbera ziman û zemên(demê) û ziman û ramanê jî pêwendiyeke zanistî ya bivênevê ye.

Du pergalên zimên ên bingehîn ku di domana peresîna fîzyolojî û biyolojiya mirov de bi civakîbûna wî/wê re derdikeve holê, hene. Her mirov bi destkeftina behreya zimên re ji dayik dibe û zimanê civaka ku pê diaxive, fêr dibe. Û digel kemilîna mêjiyê mirov û pêşveçûna pergala mêjî, bastûra hişmendiya mirov jî têkûz dibe. Û mirov hin bi hin wî zimanê ku di zarokatî an ciwaniya xwe de fêr dibe/bûye, bi kar tînê. Ev têgînên ku ji roja ku ji dayîk bûye û heta îro bi dest xistine, hemû, têgihên wî zimanê ku ji der û dora xwe fêr bûye û di binhişîna xwe de bi cih kiriye ye.

Geşedaniya têgihî ya ku di domana perwerdehiyê de pêşve diçe, li hin têgihên nû yên din dadigere.Têgihên zimên ên ku ji hêla civakê ve pêk tên, tev girêdayî awa û şêwaza jiyanê, têkilî nêrîn û ferseta civakê, têkilî têgihîştin û binavkirina dab û gerdîşên civakî, têkilî dîrok û mercên erdnîgariya civakê têkilî aborî û rabirdûya civakê… û hwd. dişêwe.

Her civak, li gorî pêdivî û diviyatiyên xwe yên rojane zimanekî pêk tîne. Û zimanê xwe, li gorî merc û derfetên jiyanê û geşedaniya demê nû dike û diguherîne. Takekes dibe, civak dibe; hîndekarî, perwerdehî, ceribandin, hişmendî û derûniya xwe li gorî axaftin û vegotina xwe ya ku bi vî zimanî bi dest xistiye, dixebitîne. Divê ziman tu car wekî komiçk an jî navnîşka, gotin û biwêjên bêwate an jî gencîneya peyvên biwate neyê dîtin û pejirandin. Ji lewre ew, gelek pergal û bastûrên mezin ên din (ên têgihî) di xwe de dihewîne. Heke mirov bi vê ferasetê tevbigere û di vê çarçoveyê de nêzîkî zimên bibe, wê gavê dê ziman li gorî kêmbûn û zêdebûna gotin û peyvan qels an jî dewlemend, were hesibandin. Û ev nirxandin jî gelekî dûrî qistas û krîterên zanistî ye.

Ziman pîvanga rikn û ripinê hebûna mirov e. Jiyana mirov li gorî rewşa aborî an jî awa û mercên hilberiyê teşe digire. Hebûna mirov li ser riknê sêpêka civak-çand û raman tê rûnandin. Têkiliya navbera ziman û ramanê bandoreke mezin li ser mezrîngeyên civakî dihêle û gelek nirxên nû dihilberîne. Hilberandin û afirandina alav û amrazên nû yên hilberiyê, digel zêdebûna peyv û biwêjên nûjen, hişmendiya civakê xurtir û hûnandina tevn û tora têgihên zimên jî nûjentir dike. Hem bedewkariya ber û berhmên hunerî û hem jî qesr û



qonaxên bihişmet ên ku bi hostetî hatine avakirin, hemû ji wan peyvên ku li ziman zêde dibin pêk tên û qîmetdar dibin.

Pergala zimanê civakekê, bastûra mezrîngeyên wê civakê ye jî. Xurtbûna zimên û xurtbûna sazî û dezgehên civakê li hevdû derdikevin. Ji bo nimûne, heke di civakekê de hunera destkariyê pêşve çûbe, girêdayî wê, têgih û bêjeyên di vî warî de, ango zimanê hunera destkariyê jî, pêşve diçe.

Pêwendî û girêdaniya ziman û ramanê bandoreke mezin li ser jiyana mirov a civakî dihêle. Ev bandor û hevhîkariya navbera ziman û ramanê, gelek hêmayên çandî derdixe holê û guherîn û veguherînên civakî pêk tîne. Pergala ziman her gav wekî ber û berhema mêjiyê mirov a herî tekûz, kamil û gihaştî tê qebûlkirin.

Di civakê de, ber, bergeh û dîmendariyên afirîndetî an jî hilberîneriya ku bi hizr û ramanê mirov re der dibin, xwe dispêrên hêz û xurtbûna zimên. Û ev ziman jî, zimanê zanistê bi xwe ye. Belê zerengî(kapasite) û çawaniya zimên a ku girêdayî ramana zanistî ya gerdûnî pêk tê, xwediyê gelek rist û rêbazên resen û xweser e jî. Zimanê zanistî, ligel ku ji zimanê civakê dinime jî, tu carî bi zimanê rojanê yê civakê jî nayê ser. Zimanê zanistê bi gelek têgih û azîneyên xwe yên xweser, xwediyê pergaleke ciyawaz û cuda ye.

Di pêwendiya navbera ziman û zanînê de hewcetî bi têgihên nû heye. Zanîna ku peyam û gihanekên zanistî vedugêhêze civaka bê, gelek merc û taybetmendiyên heyberî(tişteyî) di xwe de dihewîne. Her wiha, digel ku kan û jêdera zimanê zanistê, zimanê civakê yê devkî bi xwe be jî, dîsa awa û şêwaza vî zimanî gelekî cihê ye û sînorê têgihên vî zimanî-li gorî zimanê hinekî rojane- hinekî tixûbdar dike.

Ligel her tiştî, ziman hebûneke jîndar e û her gav xwe nû dike. Em bixwazin û nexwazin jî ziman xwe li gorî zemên nû dike.

Kaniya Helbestan

## KEKÊ KAMIL

**Letîf Epozdemir**

Mirov rengê axa xwe dide
kekê Kamil
mînanî pincara deşta
Mûşê

Yan ji, bayê ki sar
ji bilıindiya Serhedê.

Mîna ava zelal
ya behra Wanê
yan ji genimê Herranê
Mirov rengê axa xwe dide
Kekê Kamil

Gava mirov termê
zarokên nîvkuştî
himbêz dike li Helepçê
Berfa çiyayê Sîpanê bi
bîra mirov dikevê.

Ku wekî rûyê zarokan
paqij û sipî ye
Erê kekê Kamil
Erê
Tê bîra te
ez û tû
li deryê Qasimlû

Li tenişta Kela Dimdim
li bajêrê Şino
Em li kolanan
mil bi mil di geriyan

Kevok li ber pıyê me bûn,
lê
ne direviyan
Û dengê Kewan
ji zinarên Dizê dihat,wek
taviyan.

Erê Kekê Kamil Erê
rûsar e mirata mirinê
Tam sar e, ne mînaye
jiyan ê

Mirov di sedsaliya emrê
xwe de jî
Naxwaze ku bimre, divê
ku bijî

Erê kekê Kamil erê
mirov mînanî axa xwe ye
Mînanî mal û welatê xwe.

Mînanî birinca Şêrwan
Baqleyên Dêrsimê
Yan jî, pembûyê Rihayê
yan fistiqên Entabê.
Mirov rengê roja xwe dide
Ku tîrêja xwe dide axê

Mirov rengê çiyayê
xwe dide
Kekê Kamil, rengê av
û axa xwe....

merheba ji ter e
ey mizgîna felatê
û çima dereng mayî
bi xêr hatî civatê.

Bi milyona belengaz
îro li benda te ne.
Tu jî, ji wan re bibe
meşaleya xebatê.

Sed silav li ser te bin
Çar û yara neçar a
Zûtir me bike rizgar
ji zilmê û bin dar a

Her Kurdekî
şerefmend
divê bi te kubar be
Ne zû ye ne jî dereng
li hespê xwe siwar be.

Tu serdarê rastıya
bi xêr hatî ey çira
Girtiyê tariyê ne
ronî bike tu bira.

Me bi te anî îro
bawerî û îmanê
Me nede şermê tu jî
rewşen bike jiyanê

Ev çendik û çend Sal e
em bi te serfiraz in
Ku tu yî şivanê me
em bi te bi mirazn.

Te pir çetnahi dîtin
û te deryê xwe ne girt
Baran barî bi ser me
tofan bi ser me ve girt

Bi dehan kesî îro
koçebar bûn ji dinê
Têr ne xwarin mixab in
ji fêkiyê evîn ê.

www.arsivakurdi.org

# Xaçepirs

Amadekar: Şehab Xalidî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 | 10 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | ■ | | | | | | | ■ | |
| 2 | | | ■ | | | | | ■ | | ○1 |
| 3 | | | | ■ | ■ | ■ | ■ | | | |
| 4 | | | ■ | | | | | ■ | | |
| 5 | | | ■ | | | | | ■ | | |
| 6 | | ○4 | ○2 | ■ | | ○3 | ■ | | | |
| 7 | | | ■ | | | | | ■ | | |
| 8 | | ■ | | | ■ | ■ | | | ■ | |
| 9 | ■ | | ■ | | | | | ■ | | ■ |
| 10 | ■ | | | | | | | | | ■ |

Peyva veşartî ○ ○ ○ ○
1 2 3 4

**Çeprast:**
1. Saziya leşkerî ya nepenî a Cihûyan.
2. Berevajî di Soranî de tê wateya **ku** – Heywanek e – Re.
3. Werz – Ne tenê.
4. Sivikkiriya peyva “Eger” di Farsî de – Navê bajarekî Kurdistanê ye – Ji dayîk bû.
5. Ba – Di Erebî de tê wateya malbatê – Heke E bihê zêdekirin di Erebî de tê wateya çav.
6. Xwe di Farsî de – Berevajî tê wateya heya – Ne xuya.
7. Berevajî tê wateya bêy – **Diçim** di Soranî de – Bilêvkirina tîpa **N** di Kurmancî de.
8. Pêleke radyoyî ye – Sirûda neteweyî ya Kurdan bi vê peyvê dest pê diket.
9. Navê mêra ye.
10. Serkomarê Kureya Başûr.

**Serjêr:**
1. Navê jineke şoreşvan a Kurd e.
2. Navê giravekê ye – Di Îngilîzî de tê wateya “in” (Bi rastnivîsa Kurmancî).
4. Derd û êş di Farsî de – Hekî bê du car kirin, dibêjne zarokên sawa – Parlemana Berîtaniyayê ye.
5. Bilivkirina tîpa **G** di Kurmancî de – Navê mehekê ye di Erebî de – Bilez.
6. Şerm – Saziya Atlantîk a Bakûr – Berevajî tê wateya “Ê!”.
7. Hekî Î bê zêdekirin, yekîniyeke(wehideke) pîvanê ye – Di Erebî de zaf bi kar tê – Hekî A bê zêdekirin navê TV’yekê bû.
9. Navê straneke xweş a Kurdî ye – Kurtkiriya hilkirinê di Îngilîzî de.
10. Qaziyê (Dozgerê) dadgeha li derheq terora Kazim Recewî.

# Sudoku

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | 3 | 8 | | | | | 9 |
| 6 | | | | 5 | 9 | 8 | | |
| | | | | | | | | |
| | | 7 | | | | | 5 | |
| 4 | 1 | | 3 | | 2 | | 8 | 7 |
| | 3 | | | | | 6 | | |
| | | | | | | | | |
| | | 1 | 7 | 8 | | | | 4 |
| 8 | | | | | 3 | 2 | | 6 |

**Xwendevanên hêja!**
**Ji bo serrast kirina “Sudoku” wan xalên jêrîn li berçav bigirin**

**1. Hejmarên 1-9’ê di rêza serjêr de dubare nabin.**
**2. Hejmarên 1-9’ê di rêza çeprast de dubare nabin.**
**3. Hejmarên 1-9’ê di nava stûneke 3×3 de dubare nabin.**

## Bersiva Xaçepirsa hejmara

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 | 10 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | S | O | B | A | ■ | ■ | H | U | R | E |
| 2 | U | M | A | L | ■ | ■ | Î | N | E | R |
| 3 | L | E | (K)4 | ■ | J | (Î)2 | ■ | U | P | U |
| 4 | U | R | ■ | Ç | Î | P | S | ■ | Î | S |
| 5 | N | ■ | (Ş)3 | I | R | ■ | E | M | ■ | Î |
| 6 | ■ | N | A | Y | ■ | A | N | A | R | ■ |
| 7 | R | ■ | F | A | L | ■ | (T)1 | Î | ■ | K |
| 8 | A | Ç | ■ | N | O | Z | O | ■ | Q | I |
| 9 | Z | E | N | ■ | Ç | A | ■ | X | I | R |
| 10 | Î | N | Î | W | ■ | ■ | S | A | R | S |

Peyva veşartî (T) (Î) (Ş) (K)
1 2 3 4

## Bersiva Sudoku a hejmara 39’an

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 4 | 9 | 8 | 7 | 6 | 2 | 5 | 1 | 3 |
| 5 | 1 | 7 | 9 | 8 | 3 | 2 | 6 | 4 |
| 3 | 6 | 2 | 4 | 5 | 1 | 8 | 7 | 9 |
| 2 | 5 | 4 | 8 | 9 | 6 | 1 | 3 | 7 |
| 1 | 8 | 3 | 2 | 4 | 7 | 6 | 9 | 5 |
| 9 | 7 | 6 | 3 | 1 | 5 | 4 | 8 | 2 |
| 8 | 2 | 1 | 5 | 3 | 9 | 7 | 4 | 6 |
| 7 | 4 | 9 | 6 | 2 | 8 | 3 | 5 | 1 |
| 6 | 3 | 5 | 1 | 7 | 4 | 9 | 2 | 8 |

www.arsivakurdi.org

agirî

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî
Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/index.php


Navnîşana derveyî welat: AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 –FRANCE
E - Mail:

agiri2003@hotmail.com



# Bi Hinceta 17'mîn Salvegera Terora Dr. Qasimlo, Yekîtiya Ciwanan Li Derveyî Welat Gazî Ji Bo Pişikdarîkirin Di Meşekê De Li Otrîşê kir

## Bîr û navê Dr. Qasimlo çirayê rêya xebata me ye



*Rêberê navdar yê Kurd Dr. Ebdulrehman Qasimlo, 13.07.1989'an li welatê Otrîşê bi destê dîplomatên terorîst ên Komara Îslamî ya Îranê hate şehîd kirin*

Ciwanên Xweştivî!
Keç, û Kurên Xebatkar!

**Mafxwazno!**
**Azadîxwazno!**

Bi merema ji bîr nekirina rêbaza pir ji şanazî a Dr. Qasimlo, bi merema dîsan dijberî kirina tevî terorîzm û tund û tûjî ya dewletî, bi merema ser taze mehkûmkirina bikujên rêberê mezin yê Kurd Dr. Qasimlo, Yekêtiya Ciwanên Dmokrat ya Kurdistana Îranê li derveyî welat, bi pêşengiya Komîteya Ciwanên Swêdê, roja 13.07.2006'an, 17' mîn salvegera terora Dr. Qasimlo bi destê dîplomatên terorîst yên rejîma Îranê, li ber deriyê koşka Serok Wezîran, li welatê Otrîşê, welatek ku ji bo parastina mifah û berjewendiyên abûrî yên xwe nevêrokane bikujên Dr. Qasimlo û kekê Ebdula Qadirî Azer bi kinc û cilên bi xwîn şandine Tehranê, meşekê birêve dibe.


Em ji rêya vê bangewazê, gaziya hemû Rêxistinên pêşkevtinxwaz û welatparêz dikin ku ji bo eşkerekirina zêdetir ya cinayetên rejîma terorîst ya Îranê û bi armanca bi karxistina dosya Dr. Qasimlo di vê meşê de pişikdariyê bikin û bi dijatî tevî teror û terorîzmê, alîkar û piştevanên me bin.

**Ji bo zaniyariyên zêdetir pêwendiyê tevî**

**E-mail:**
**qasimlou@lawan.se**

**Telefon:**
**00 46 707753842**
**00 46 735827763**

# Malpera Me Ya NÛ




Beşa Kurmancî ya malpera kurdistanmedia.com (malpera rojnameya Agirî) demek e weşana xwe di formeke nû de dest pê kiriye. Xwendevanên hêja dikarin nûçe, rapor, bûyer, gotar, hevpeyvînan der barê rewşa gelê Kurd li Kurdistana Îranê di malpera me di bixwînin. Her wiha gelek mijarên çandî, hunerî, wêjeyî, civakî, raman û hwd... di malpera me de hene.

Navnîşanê malpera me:
**http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/index.php**
**E Mail: kurmanci@kurdistanmedia.com**

## Zanist û Teknolojî

### Heta Dawiya Îsal Hûn Dikarin Belaş Û Bê Heq Telefonê Ji Bo Mal Û Mobaylan Bikin

**Hemîd Durûdî**



***"Skype" buhaya peywendiyên telefonî yên Bakûra Amerîka bi tevahî ji nav dibe.***

Di Daxuyaniyekê de "Skype"ê da zanîn ku hetanî dawiya îsal bikarînerên "Skype"ê dikarin belaş û bê heq telefonê ji bo telefonên mal û Mobaylan bikin.

Sedema vî karî jî eva ye ku mişteriyên nû ji Bakûra Amerîka bo aliyê vê alavê bikşînin.

Ji ber vê yekê ku bikarînerên "Skype"ê li Amerîka û Kanadayê ji cihên din kêmtir in, renge ev kare bibe sedema rakişandina bala bikarînerên nû di van herêmane de.

Mixabin ev belaş û xwerayî telefon kirine tenê ji bo têkilî çêkirin tevî hejmar telefonên welatên Kanada û Amerîkaya Bakûr de ye.

Mirov dikare bi rihet ji rêya programa "Skype"ê bi zelalî bi hev re biaxive û hevdu temaşe bike.




**Jêder: www.cagle.com**

TISHK TV

**Navnîşanên TISHK TV:**
Satellite: **Hotbird-4**

Frequency: **12692 MHz**

Polarization: **Horizontal**
Symbol Rate: **27500**
**FEC: 3/4**
www.tishktv.net

TISHK

**Tel:**
**00 33 -1- 41621119**
**Fax:**
**00 33 -1- 41621127**
**E Mail:**
**info@tishktv.net**

www.arsivakurd.org